

Die Senatorin für Kinder und Bildung · Rembertiring 8-12 · 28195 Bremen

Ji bo
Tevahiya Dêûbavan ango Berpirsyarên Qanûnî

Auskunft erteilt
Helena Justa

Zimmer 411

Tel. 0421 361-12604
Fax 0421 496-12604

E-Mail:
helena.justa@
kinder.bremen.de

Mein Zeichen
(bitte bei Antwort angeben)
30

Bremen, 17.09.2021

Rêzicknameya nû ya karantînaya ji bo zarokên li navendên zarokan ên danê rojê û navendên lînêrîna danê rojê: piştî roja 5an derfeta ji jêxilasbûna bi riya testê

Stî û mîrzayên rêzdar,
dêûbav ango lînêrên qanûnî yên hêja,

bi vê nivîsê re ez dixwazin di derbarê rêzicknameyên nû yên karantînaya ji bo zarokan de agahî bidim we, ku li navendên zarokan ên danê rojê û li navendên lînêrîna danê rojê yên welatê Bremenê ne.

Di **17.09.2021**an de li Bremenê pêşniyarên Konferansa Tenduristiyê ya Serokwezîran dê were bicîanîn:

Li gorî vê yekê zarokên, ku li navendên zarokan an jî li navendên lînêrîna zarokan ên danê rojê di bûyereke pozîtîv a nexweşiyê de wekî kesên têkildar ên nêzîk hatibin diyarkirin, hingê **piştî 5 rojan bi riya testê ji vê yekê xilas dibin.**

Mînak:

1. Testa zarokekî/e di koma hêlîna zarokê/a te de pozîtîv dertê. Ev zarokê/a testa wî/wê pozîtîv cara dawî roja pêncsemê li hêlînê bû.
2. Navenda lînêrîna zarokan wekî dêûbav/lînêrên zarokan ên qanûnî we agahdar dike, ku têkiliya zarokê/a we bi zarokekî/e re çêbûye, ku testa wî/wê pozîtîv derketiye. Ew ji we re dibêje, ku ji ber vê yekê divê zarokê we bikeve **karantînayê.**

3. Zarokê/a we dikare di **roja 5an** a piştî têkiliya dawî ya bi zarokê/a e testa wî/wê pozîfîv re bi riya **testê xwe ji vê yekê xilas** bike. Di rewşeke wisa de ev tê wê wateyê, ku zarokê/a we dikare ji sêşemê û wir ve here hêlînî, bi şertê ku bikaribe encama testa xwe ya negatîv be nîşan bide.

Hûn dikarin vê testê li malê bi xwe bikin an jî bi zarokê/a xwe re herin navendeke testê. Gava hûn testê bi xwe çêkin (**ango testa xweser û bi serê xwe**), hingê ji kerema xwe re daxuyaniya pê ve bi xwe re bînin hêlînê. Zarokên test nebûne bi qasî 14 rojan di karantînayê de dimînin.

Rêzîknameyên Daîreya Tenduristiyê ya berpirsyar hêj jî derbas dibin.

Ji bo zarokên we yê diçin paşdibistanê heman rêbazên ji bo dibistanên seretayî derbas dibin.

Li gel silavên germ
Peywirdar

Kathrin Blumenhagen
Rêveberiya Saziya Ciwanan a Welêt